Daîreya Koçberan ji 1.9.2019 ve belgenameyên mafê karkirina penaxwazan dide

Xwedîkar dikarin ji 1.9.2019 ji Daîreya Koçberan belgenameya mafê karkirina penaxwazan bikin. Daîreya Koçberan belgenameyê bo penaxwazan dişîne û ew dikarin wê nîşanî xwedîkarê xwe bidin.

Li gel vê guherandinê hejmara xizmetkirina xwedîkaran 30.9.2019 tê girtin.

Herwiha penaxwaz jî dikare eger hewce be dawa belgenameya mafê karkirinê bike ku bi pare ye.

Xwedîkar çawa dikare ji mafê karkirinê yê penaxwazan pi**ş**tras bibe?

Erkê xwedîkaran e ku piştrast bibe ji mafê karkirinê yê karkerên xwe. Xwedîkar dikare derbarê mafê karkirina karkerê xwe jê bipirse û wisa piştrast bibe. Xwedîkar herwiha dikare dawa belgenameya mafê karkirinê bike ku bi pare ye.

Wisa dikarî belgenameya mafê karkirina penaxwazan dawa bikî

1. Bihayê dawakirina belgenameyê bide ku 20 € ye. Fatûre hewce ye gava dawa bikî. Agahiyên çawaniya paredanê li ser formê ne.

2. Formê dagire: Pyyntö työnteko-oikeustodistuksen saamiseksi Maahanmuuttovirastolta.

3. Formê û fatûreya paredanê bi posteya elektronîkî bişîne navnîşana migri@migri.fi. Dikarî formê poste jî bikî ser navnîşana PL 10 00086 Maahanmuuttovirasto.

4. Daîreya Koçberan dê belgenameyê bo karkerê te bişîne.

Penaxwaz dikare ji kû agahiyên Mistä turvapaikanhakija saa tietoa työnteko-oikeudestaan?

- Dema dawakirina mafê penaberiyê dê belavoka ”Agahî li ser mafê karkirinê” bidinê ku zanîn li ser destpêkirina mafê karkirinê tê de heye.
- Mafê karkirinê li ser biryarê û karta îqameyê hatiye diyarkirin.
- penaxwaz jî dikare eger hewce be dawa belgenameya mafê karkirinê bike ku bi pare ye
- Li ser mafêkarkirinê behs tê kirin li malpera bi navnîşana migri.fi/turvapaikanhakijan-tyonteko-oikeus

Penaxwazan kengî mafê karkirinê heye?

Penaxwazan mafê karkirinê li Fînlandayê heye sê yan şeş mehan ji hingê ve ku wan dawa mafê penaberiyê kiriye.

Dem sê meh e eger penaxwazî pasport an belgeyeke din ya seferkirinê ya eslî û qanûnî pêşkêş kiribe bo karmendan. Dem şeş meh eger penaxwazî belgenameyeke seferkirinê ya wisa pêşkêş nekiribe.

Mafê karkirinê yê penaxwazî namîne yan hingê gava ku biryara wî bo bicihkirinê bikêrhatî dibe anku gava ku li gor qanûnê bikarin wî ji welat derxin yan jî hingê ku biryar ketiye hukmê qanûnî anku êdî dema itirazkirinê nemaye.

Eger biryara penaxwazî berî 1.6.2019 bo bicihkirinê bikêrhatî bû, mafê karkirinê hingê namîne gava ku biryar dikeve hukmê qanûnî. Eger berî 1.6.2019 biryar bo bicihkirinê ne bikêrhatî bû, mafê karkirina penaxwazî namîne gava ku biryar bo bicihkirinê bikêrhatî dibe.